## BANGA ME YA JI BO NEWROZA AZADÎ Û DEMOKRASIYÊ

Em îsal Newroza 21ê Adarê, roja hişyarbûn û nûbûnê, bi şîara “Newroza Azadî û Demokrasiyê” pêşwazî dikin. Newroz vîna ronahiyê ye li dijî tarîtiyê, vîna berxwedanê ye li dijî zilmê, vîna hebûnê ye li dijî înkarê, vîna jiyaneke birûmet û mirovane ye li dijî kedxwariyê û vîna vejîna rêxistinkirî ye li dijî bêhêvîtiyê. Newroz ji bo gelan bîreke çandî ya hevpar e; meşa azadiyê ya bindestan, lêgerîna edaletê û vîna jiyaneke birûmet e ku wekî zanîn û hişmendiyeke dîrokî heta roja îro hatiye veguhastin.

Di tevahiya dîrokê de gelên ku li dijî pêkutî, mêtingerî, kedxwarî, înkar û asîmîlasyonê li ber xwe dane, li dora agirê Newrozê xwe rêxistin kirine; nasname, çand û baweriyên xwe parastine, hevgirtina xwe xurtir kirine û meşa xwe ya azadiyê mayînde kirine. Agirê Newrozê bûye dengvedana hebûnê û dengê gerdûnî yê bindestan û hemû kesên ku tên tunehesibandin û bêdengkirin. Vê mîrasa dîrokî berdewamiya têkoşînê ava kiriye û hêvî veguherandiye hêzeke civakî.

Piştî banga dîrokî ya Rêzdar Abdullah Ocalan a 27ê Sibata 2025an, me saleke têkoşînê li pey xwe hişt. Rêzdar Ocalan û tevgera wî ji bo pêşveçûna pêvajoyê hemû gavên pêwîst avêtin û daxwazên siyasî bi cih anîn. Gelê kurd û hêzên demokrasiyê di vê pêvajoyê de ji bo çareserî û veguherîna demokratîk piştgiriya pêwîst da. Gavên ku piştî bangewaziya Rêzdar Ocalan hatin avêtin, îradeya gelan a ji bo avakirina jiyaneke wekhev xurtir kir û hişt ku hêza rêxistinkirî ya gel li meydanan bibe xwedî encamên siyasî.

Di vê pêvajoyê de avakirina komîsyonekê ji aliyê dewletê ve di bin banê Meclîsê de girîng bû, lê belê rapora dawî ya hatî eşkerakirin ne xwedî wê naverokê bû ku bendewariyên gelê kurd, yên bindestan û raya giştî ya demokratîk bi cih bîne. Meclîs û siyaseta ku divê bibe navenda çareseriyê, mixabin hê navê pirsgirêka kurd rast hilnedaye û wêrekî û berpirsyariya pêwîst nîşan nedaye.

Ji bo ku aştî pêk were û pêvajo ber bi asta entegrasyoneke pozîtîf ve biçe, azadiya fîzîkî ya Rêzdar Ocalan û peydakirina mercên guncan ên xebatê ji bo wî, pêdiviyeke lezgîn û zarûrî ye. Niha em ber bi qonaxa duyem a pêvajoyê ve diçin. Di vê demê de divê serê pêşîn "prensîba hêviyê" bê bicihkirin û mercên wekhev ên muzakereyê bên avakirin. Li ser vî esasî, sepandina pêşniyarên raporê yên li ser demokratîkbûnê û pêkanîna guhartinên qanûnî û destûrî ji bo qonaxa duyemîn a pêvajoyê, gaveke jêneger e.

Aştî û Civaka Demokratîk ji daxwazeke siyasî wêdetir, pêvajoyeke avakariya civakî ye. Ev ji bo me tê wateya civakeke ku tê de hemû cihêrengî wekî dewlemendî tên qebûlkirin, îradeya xwerêvebirina herêmî tê xurtkirin, azadiya jinê wekî prensîba bingehîn tê pejirandin û jiyaneke hevaheng bi xwezayê re bê avakirin. Jin çi qasî azad bibin, civak jî dê ew qasî azad bibe; kedxwarî û talana xwezayê çi qasî kêm bibe, edalet jî dê ew qasî bihêz bibe.

Çanda berxwedanê ya Newrozê bi tecrûbeya dîrokî nîşanî me dide ku azadî û demokrasî bi hêza gelan, bi hevgirtinê û bi civaka rêxistinkirî tê avakirin. Temînata ked, azadî û demokrasiyê pêşengiya jinan, dînamîzma ciwanan, berxwedana kedkaran û piştevaniya gelan e. Îro em bi biryardariya belavkirina Banga Aştî û Civaka Demokratîk û bi hedefa mezinkirina civaka demokratîk, sosyalîst û komunal, Newrozê pêşwazî dikin. Newroz îradeya avakirina pergaleke nû ya civakî xurtir dike ku tê de mafê jiyanê yê gelan hatibe misogerkirin, vîna wan hatibe naskirin, hiqûqeke demokratîk li kar be û azadiya

xweîfadekirin û xwerêxistinkirinê sazûmanî bûbe. Hemû cihêrengî û cudahiyên me dikarin bi nasname, ziman, bawerî û çandên xwe bi awayekî wekhev û azad bijîn. Tekane rêya pêkanîna vê jî têkoşîn û berxwedana hevpar e; em ê jî îsal bi vê bîr û baweriyê li qadên Newrozê kom bibin.

Tevî hemû zext û qedexeyan jî Newroz bi îradeya gelan geştir bûye. Agirê Newrozê dê îro jî wekî zanîn û bîreke civakî rengê xwe bide qadan, dê berxwedanê mezintir bike û berpirsyariya avakirina jiyana hevpar xurtir bike. Bi milyonan kesên li qadan dê daxwazên xwe yên ji bo demokrasî, dadmendî  û azadiyê bi dengekî bilind biqêrin.

Jinên ku li dijî hişmendiya mêrperest têkoşîneke bêdawî dane û didin, bi berxwedana Rehşan, Ronahî, Zekiye, Bêrîvan, Kader, Îvana û gelekên mîna wan, îro pêşengiya civaka demokratîk dikin. Îradeya jinan a azadiyê îro bi felsefeya **“Jin, Jiyan, Azadî”**yê dibe diruşma jinên cîhanê û mizgîniya jiyaneke nû dide mirovahiyê.

Dinya îro bi alozî, qeyran û di demên dijwar re derbas dibe; êrîşkariya hêzên emperyalîst û zordestiya hegemonîk tevî hêzên herêmî yên kevneperest û paşvero bi rêya şer, dagirkerî û komkujiyan hewl dide gelan bindest bike û xwezayê qir bike. Rojhilata Navîn di navenda vê lîstika bixwîn de ye. Tiştên ku li Filistîn, Sûriye, Îran, Ûkrayna û Venezuelayê diqewimin, beşên vê plana kujer in. Jiyan û siberoja mirovahiyê dibin vê gefê de ye. Berxwedana neteweyî ya kurdan ku di şexsê Şoreşa Rojava de şîn bû, bû sembola gerdûnî ya parastina rûmeta mirovahiyê. Ruhê Newrozê yê ku dê rê li ber jiyanek e nû veke, tam ev ruh e.

Em bang li jin, ciwan, kedkar, karker, hunermend, rewşenbîr û hemû gel û baweriyan dikin; em bang li hemû hêzên aştiyê dikin ku werin em li qadên Newrozê kom bibin; em hêviyan geştir, hevgirtinê xurtir û agirê Newroza azadî û Demokrasiyê gur û geştir  bikin.

**Newroz Pîroz Be!**